Ferd – Balkêşî - Danûstandin

Kurtasîya Konsêpta Mala Zarokan

ya Birêvebirîya **Malên Zarokan**

Konsêpt-e ji bo Malên Zarokan yên Rojane gGmbH

Naverok

1. Destpêk **3**

2. Şertên Çarçûvê **3**

3. Element-i-Pedajojîk: Ferd, Balkêşî, Danûstandin **4**

3.1 Armancên sereke yên xebata me ya pedagojîk **5**

4.Perwerdeya Beşdarî **7**

1. Destpêk

Ev kurtenivîsa konseptê ji bo dê û bavên zarokan yên zarokên wan di mala zarokan de ne û ji bo rêvebirê konsept-e yên mala zarokan ya rojane gGmbH ye. Ev çarçûve, avakirin û armancên pedagojîk yên vê xebata li malên zarokan dîyar dike. Ji bo agahîyên kûr yên bi dirêjî, element-i, konsepta mala zarokan li berdest e[1].

Elemet-i-mala zarokan, bi perwerdeya xwe ya serbixwe, xwe weke sazîyên alîkarîyên malbatan û yên kêmasîyên malbatan temam dikin dibîne. Ew lêmêzekirina temamê rojê, fleksîbîlîta herî mezin û di heman demê de jî daxwazên qalîteyê bi cîh tine.

Barhilgirtvanê malên zarokan komelên ji bo menfeata temamî civakê yên tescîlkirî li Stuttgartê û Kind und Beruf e.V. (Zarok û Xebat e.V.) û weke Konzept-e ji bo Malên Zarokan yên Rojane,g GmbH ne.Van kar û birêvebirina malên zarokên xwe dane Konzept-e für Kindertageştätten GmbH (Mala Ropjane ya Zarokan).

2. Mercên Çarçûvê

Dezgeh gorî îhtîyac û aborîyê di navbera saet 7.00 û 20.00 de vekirîne. Di navbera dema vekirî de, zarok dikarin temamê rojê (herî zêde 50 saet di heftê de), nîvrojî (heta xwerina nîvro yan jî piştî xwarina nîvro) yan jî fleksîbel (30 saetî di heftê de, herî kêm ji bo sê rojan) gorî îhtîyaca şexsî û lêhevkirinê, bimînin. Ev flesîbîlîta divê li gorî daxwazên şexsî yên plana rojane ya malbatê were çêkirin. Dîsa jî Zemanê esasî (Kernzeit)jî heye, ku li ser textê reş yên Mala Zarokan dîyar e. Di vê demê de û di dema xwarinê de, divê malbat ne zarokên xwe bînin û ne jî werin wan bibin. Em li ser vî zemanî gelekî disekinin û qîmeteke pirr mezin jî didinê.

Rojên girtî yên malên zarokan gorî tatîlên dibistana wê herêmê ne û xeynê wê jî salê carekê, roja înîyekê tên girtin ji bo pêşxistina perwerdekirina karmendên xwe. Ev rojana di demê de tên dîyar kirin.

Hêjmara karmendan gorî tarîfa ji bo wî bajarî hatîye çêkirin û gor hêjmaran zarokên ku li wêr amade ne tê tespît kirin.

Nimûna derbasbûna rojê

7.00, 7.30 yan jî 8.00 Vebûna Mala Zarokan

7.00 – 9.30 Lîstika serbest / Taştêya serbest

9.30 – 10.00 Konferansa Zarokan

[1] Ev li gel qeydkirinê bi agahdarîyên malan re hatîye şandin. Xeynê vê jî, ev him li ser malpera konsêpt-e ya GmbH û him jî di ketina interneta malên zarokan de her dem dikare were dîtin.

10.00 – 12.00 Beşê çalakî û projeyan 1. Zemanê esasî

12.00 – 12.30 Firavîn, (xwarina nîvro), 2. Zemanê esasî

12.30 – 14.30 Beşê aramîyê / raketin

15.00 – 16.00 Xwarina piçûk / Çalakî / Proje 3. Zemanê esasî

16.00 – Girtin Lîstika serbest, divê hûn hêdî hêdî werin zarokên xwe bibin.

Saet di 17.00, 17.30, 18.00 yan jî 20.00 de Mala Zarokan tê girtin.

3. Pedagojîya-elemet-i: meriv, hezkirin, danûstandin[2]

Konzepta Mala Zarokan element-i li ser hîmê xwe bi xwe perwerde kirina zarokan ya bi serê xwe çalakbûn û ku bi temamî li ser ruh, can û laşê merivan pêk tê. Bawerî bi qabîlîyeta zarokan anîn û naskirina wê perçên bingeha pedagojîya me ne. Em dibêjin zarok xwedîyê qabîlîyet û îmkana ne, dive em wan bibînin û li ser wan bixebitin. Bi hev re lîstik di bin çavdêrîyeke bi îtîna û ewlekarîyê de, em, heta ji destê me tê, cîh didin hezkirinin wan yên şexsî û biryarên wan. Ev alîkarîya bi sere xwe bûnê û angajmana zarokan dike û wê bi pêş ve dibe. Ev tê wê maneyê, ku zarok gorî temenê xwe û gorî pêşketinên xwe û xeynî vê jî bê çavdêrîyeke raste rast bikaribin bileyîzin û em ji bo wan cîhê ku ew karibin jîyana xwe ya zaroktîyê bikar bînin ji wan re vebikin.

Însan bi temamî gorî **şehxê** xwe di herêma ku ji bo wî **balkêş** e û bi **danûstandina** yên dinan re xwe perwerde dike.

[2] Nivîsa bi dirêjî ya li ser bingeha xebata me ya pedagojîk, ya di bin beşên; Leyîztin hînbûna bi kêf e, Karmendên pedagojîk weke rêber û rêhevalên pêvajoya perwerdeyî ya zarokatîyê, çavdêrî û dokûmentkirin weke navgînên tevgera pedagojîk, livandin, xwe bi zimên îfadekirin, xwarin, xweza, Entegrasyon weke armanca mala zarok, wekmavî û parastina zarok, de ye, di elemt-i ya konsêpta mala zarokan de bi dirêjahî datîye dîyar kirein.

3.1 Armancên sereke yên xebata me ya pedagojîk

Ramana sereke ya herî bilind ya konzepta Mala Zarokan elemt-i mavê her zarokî yê ji bo xwe bi pêşxistin û perwerdebûna şexsîyeta ji xwe berpirsyarî û bo ya qabîlîyeta civakî heye. (§1 Abs.1 SGB VIII).

Ev çarcûva armancên gelemperî yên herî girîn yên perwerdeyî û rewşenbîrîyê pêk tine**: serbixwebûn û pêrebûn** weke **tendurîstî, berxwedayîn û ji jîyanê hezkirin.** Ji bo karê pêkanîna armancên fêrbûn û pêşketinê yên ku di rêbaz û planên eyaletan de hatine nivîsîn esas tên girtin.

Otonomî

Naveroka otonomîyê ev e; zarokan di warê bi xwe biryargirtinê de bi pêş ve xistin û alîkarîya wan kirin e. Ji bo vê Mala Zarokan îmkanê dide wan ku azadîyê, biserêxwebûnê, berpirsîyarîyê û însîyatifa bi sere xwe, bi xwe pêk bînin û wan biceribînin. Bi vî awayî zarok dikarên weke mînak di goftûgoyeke zarokan de ya ku her roj di bin navê “Hûn dixwazên îro çi bikin?” de pêk tê, dikarên daxwazên xwe û dîtinên yên rojane bînin ziman, bidin û bistînin û bi vî awayî dikarin derbasbûna roja xwe bi serê xwe û bi awayekî demokratîk bi zarokên din re û bi pedagogan ve pêk bînin. Ev tê vê maneyê ku zarok dikaribin bi serbestî, gorî temenê xwe û pêşketina xwe bê çavdêrî bileyîzin. Ev ji bo azadîya zarokên diçin dibistanê, yên ku dixwazin bi destûra karmendan ji sazîyê derkevin, ji bo xebatên xwe herin derve û tevî lîstik û îmkanên herêmê bin jî wisa ye.

Pêvgirêdayîbûn

Pêvegirêdayîbûn ev e, ku gêrêdayî û hevbendîyê hîn bibin, weke hêjayî û bawerî pê anînê bijîn û wan karibin bidin yên dinan jî. Ji bo vê pedagog atmosfereke germ, ewleyî, bawerî, hêjayî û qebûlîyê ya ku zarok divên amade bikin, di her warî de karibin bi xwe cesaret bikin, bi serê xwe bin û xwe herî baş bi pêş ve bibin. Divê zarok jîyana civakî pêk bînin û rûmetê bidin yên dinan û daxwazên wan. Bi hev re hînî fêmkirina fikirandinê, hestkirinê û hereketên însanên dinan fêr dibin, ku wan qebûl bikin û berpirsîyarîya hereketên xwe bidin ser xwe. Di bihevre bûna rojane de qebûlkirina ji hev cûdabûnê û rêzgirtina yên ne weke wan in, fêr dibin.

Ji xeynî vê jî ji bo me ya herî girînge ev ku, em civakîyê bi xebata di komên biçûk de, di karê rojane de, di çlakîya de, bi malbat û bê malbat û xeynî têkilîyên Mala Zarokan re, geş bikin.

Tendurîstî

Tendurîstîya laşê merivan ji bo jîyaneke bextewar, çalak heta pîrbûnê şert e û meriv dikare bi berpirsîyarîya xwe wê bibandorîne. Ji bo vê jî armanceke xebata me ev e ku em bo zarokan bingehên pêwendîyên xwarina tendurist û gera têr ji bo jîyaneke tendurist dîyar bikin.

Element-i Malan Zarokan bala xwe dide xwarina bo zarokan û xwarinên baş yên herêmê û yên sezonê bikar tine. Gor dîtinên pedagojîk em qîmeteke mezin didin ser pirranî û kîjanxwarinê ya zarokan û geşbûnên erênî yên zanebûna li ser xwarinê. Gorî pêwîstîya vî babetî, me konsepteke kûr ji bo xwarinê amade kir.

Hereketkirin ne tenê perçekî îhtîyaca zarok e, bilakîs şertê îsbat kirî yê herî girîng yê pêşvebirina beden, ruh û civakî ya wî ye. Ji bo vê jî ji bo zarokan him li hundir û him jî li der îmkanên pirr cure herekt kirinê hene, yên ku di nava rojê de hatine intergre kirin û ne tenê bo zemanekî yan jî bo cîyekî hatibin sînor kirin. Di devereke balkêş û pirreng de ku zarok hereket bikin, wermandin û hêstêrkên çavan jî wê hebin. Encama herî xerab ya ne dîyar ûwê xwe di dema dûr de nîşan bide, ev e, ku meriv bixwaze hereketa zarokan bisînor bike. Zarok çi bi ceribînin dikarin wî jî hîn dibin.

Berxwedan

Yek ji bingehên Armanceke me jî pêşvebirina berxedanê ye. Ji berxedanê Perwerdezan qabîliyeta berxwedana nefsîyê ya zarokan fêm dikin. Ev qabîlîyeta berxwedanê wana fêrî rewşên jîyana dijwar yan jî ya jîyana giran dike. Berxwedan îmkanên zarokan baştir dike, ji bo guhartin û krîzên ku bi ser wan de werin, ew karibin bi hêsanî biserkevin û bi vî awayî xwe bixwe ewle bikin, karibin şexsîyetên tendirust û berpirsîyar bin.

Ji bo em karibin zarokan xurt bikin, em alîkarîya wan dikin ku ew tevî jîyana rojane ya civakî bin û wê bikemilînin, hestên xwe û daxwazên xwe bînin ziman û nakokîyan bi serê xwe çareser bikin. Ji bo vê yekê jî ji bo zarok mebestên herî girîn yên gorî temenê wî tên hilbijartin û alîkarîya wî tê kirin.

Ji jîyanê hezkirin

Qabîlîyeta hînbûnê û ya bi pêşvebirinê di însan bi xwe de heye. Hînbûn pêvajoyeke bi xwe aktifbûnê, tecrube kirinê,çareserîkirina pirsgirêkan bi awayekî çalak danûstandina bi derdorê xwe re û bi yêndin re ye. Ji bo pêvajoya hertim hînbûnê, ji jîyanê hezkirin û bi dilxweşî bi dinyayê re danûstandin, bi meraqa xwezayî ku dive jîndar be, weke xurtkirina motîva binxistina tengasîyan, bingehên herî girîng in.

Karê perwerdevan ev e, ku bi dil û can li zarokan binêhire û qeysa pêşketina wan tespît bike û tevî wan, deverên (cî û tiştan) ji bo hemû hestên wan bên teşwîk kirin amade bike. Ji bo vê jê divê ew weke însanên bi hest wana teşwîk û çalak bike ku karibe di pêvajoya perwerdekirina zarokan de alîkarîya wan bike û wan

dewlemendtir bike. Ev me dibe xebateke di cîyên bi fonksîyon, ku zarok karibin xwe ji bo intereseyên xwe konsantre bikin, weke di atolye, oda avahîkirinê, oda rolleyistinê yan jî oda hereket kirinê. Bê vê jî hêlîna çarpêçûnê (Krabblernest) ji bo biçûkan gorî temenê wan bi awayekî ewle û nêzîkbûn yên kesên nas, bê însanên daîmî, îmkanekê dide wan.

4. Perwerdeya Beşdarîyê

Hevkarîya navbera malbat û Malan Zarokan stuneke girîng e di xebata Malan Zarokan de. Li ser bingeha hev û din fêmkirin û hev û din qebûlkirin hevxebateke nêzîkbûnê ye û danûstandineke vekirî di navbera perwerdekeran û malbata zarok de bingeheke baş e ji bo li zarokan mêzekirinê. Bi vî awayî Perwerdekar malbatê weke pirsporên zarokên xwe dibînin. Di heman demê de pedagogên pirspor yên ji bo hînkirin û lêmêzekirina zarokan li sazîya bihevre ne û bi vî awayî di xebata rojane de zarokên ku bi berpirsîyarî xwe û biryarên bi serê xwe didin, dibînin.

Di despêkê de hevkarîyeke nêzîk û alîkarîyeke mezin ya malbatê divê, heta ku zarok **hîn bibin**. Em qîmetê didin dema hînbûna destpêkê ya zarokan di nava çarçûva elemet-i ya konsepta mala zarokan de û em gorî wê bi kûrayî pêk tînin. Ji bo avakirina têkilîyeke bi bawer bi zarok re di devereke nû de dikare bi tenê yan bi alîkarîya beşekî malbatê yan jî bi ya kesekî zarok bawerîya xwe pê tîne biserkeve. Ev kesa weke „bingeha ewle“ ji bo zarok e, heta ku zarok di devera nû de xwe baş bibîne û heta ku ew perwerdekarê xwe ji bo xwe weke alîkar, ewlekarê hestê xwe, bi bawerî û teselîya wî qebûl bike.

Ji bo avakirina têkilîyeke bi vî awayî ji bo zarokan du yan jî çar hefte zeman divê. Çarçûva zeman ya her kesî bi xeberdana bi perwerdekar ve tê danîn.

Ji bo vê jî malbat divê çar heftan bidin ber çavên xwe û xwe weke berpirsîyarê zarokên xwe û bi tenê di dema xebata perwerdekar de zarokên xwe bînin mala zarokan û di vê demê de divê yek ji malbatê yan jî kesekî ku zarok bi wî bawer e, li cem zarok bimîne, ku gorî îhtîyaca zarok alîkarîyê bike û bi xwe jî fêrî jîyana mala zarokan bibe. Bi serkekina dema xwe elimandinê bingeheke xurt ji bo bi bawerî bihevrebûna „Cîyê Jîyanê Mala Zarokan“ bo gelek salan çê dibe.

Perwerdekar û malbata zarok bi hev re di têkilîyê de ne û li ser pêşveketina zarok dipeyivin. Ev dan û standin him ji bo hev û din fêmkirinê ye û him jî ji bo agahdarîya herdû alîyan e. Em bi çalakên malbatan û bi inisiyatîf girtina wan jî pirr kêf xweş dibin.